

Ji bo
Dayik yan bav yan welîyê şagirdî yê klasa 3ê
li dibistana bingehî [grundskolanê] û dibistana samîyan [sameskolanê]
yan yê klasa 4ê li dibistana taybetî

Îmtîhanên giştî (yên neteweyî)

Silav!

Ev name ji te re hatiye çunkî tu dayik yan bav yan welîyê şagirdêkî yî ku dê di demsala xwendinê ya biharê de îmtîhanên giştî di madeyên matematîk, zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê de bike.

Çima şagird dê îmtîhanên giştî bikin?

Şagirdên klasa 3ê ya dibistana bingehî û dibistana samîyan û ya klasa 4ê ya dibistana taybetî dê îmtîhanên giştî bikin. Ev îmtîhan dê ji bo nirxandineka hevqîmet û adil ya zanîna şagirdan alîkar bin. Ev îmtîhan dê ji bo nirxandina zanîna şagirdan li gor şertên bidestxistina zanyariyan yên ku di plana kursan de hene alîkarîya mamostayan bikin.

Daîreya Giştî ya Dibistanan [Skolverket] wezîfeyê dide zanîngehên Stockholm û Uppsalayê ku îmtîhanan hazir û amade bikin. Pirsên îmtîhanan li gelek dibistanên cuda li seranserî welatî hatine ceribandin. Heqê şagird û mamostayan hebû ku dîtinên xwe bidin û ew li ber çav hatine wergirtin gava îmtîhan hatiye hazir kirin.

Planên kursan yên madeyên cuda dibin bingeh gava biryar li ser naverok û hazirkirina îmtîhanan tê dan. Lê ne mimkin e ku her tişt yê ku di plana kursê madeyekê de heye tevî îmtîhanê bibe. Çunkî îmtîhaneka weha dê bêhed mezin bibe.

Awayekê xebatê yê miyên yan hin alavên alîkar yên xwendinê yên taybetî ji bo îmtîhanên giştî nabin bingeh. Di îmtîhanên giştî de, divê şagird bi çend awayên cuda zanîna xwe nîşan bide.

Kengî îmtîhan dê bên kirin?

Îmtîhanên giştî ji çend qîmsên cuda pêk tên. Îmtîhan dê di demsala xwendinê ya biharê de di nava hefteyên 11-20 de bên kirin û ew îlzamî ne. Dibistan biryarê dide ka di wê demê de kîjan wextî qîsmên îmtîhanan yên cuda dê bên kirin. Fikir ew e ku çi qas mimkin be ev îmtîhan di wê demê de bibin beşek ji dersan.

Çawa îmtîhan tên nirxandin?

Agahdariyên hûrik hene ku divê mamosta di nirxandina îmtîhanên giştî de li dû here. Di demên paştir de, gava mamosta nirxandineka giştî ya zanîna şagirdêkî di madeyekê de dike, ew netîceya îmtîhanên giştî jî li ber çavan digire.

Civandina netîceyan

Daîreya Giştî ya Dibistanan bi hevkarîya Ofîsa navendî ya statistîkê [Statistiska centralbyrån (SCB)] neteweyên îmtîhanên giştî dicivîne. Civandina netîceyên îmtîhanan ji bo nirxandinê

ya ku dibistan bikin lê dîsa ji bo tehlîlên netîceyan li welatî û li belediyeyan û ji bo berpirsiyarên dibistanên xweser jî pêwîst e.

Naveroka îmtîhanên madeyan çi ye?

Îmtîhanên giştî xwedî mijareka mişterek in. Mijar li ser çîroka her du zarok Nova û Trojî hatiye ava kirin. Armanca çîrokê ew e ku tîrsa îmtîhanê nehêle û rewşê li ber şagirdan sivik bike. Piştî her qismê îmtîhanê, beşek ji wêne û teksta çîrokê di posterekê de li klasê tê daliqandin. Gava hemû beş tîs bi cih kirin, hingî çîroka her du zarokan jî bi dawî tê û şagirdan hemû qismên îmtîhanan kirine.

Matematîk

Îmtîhana giştî ya matematîkê ji qismên cuda pêk tê ku tê de pirsên nivîskî yên ku şagird bi ferdî bersiv didin û pirsên devkî yên ku şagird di komên biçûk de bersiv didin hene. Hem di pirsên nivîskî hem jî yên devkî de, îmkan ji şagirdan re tê dan nîşan bidin ku ew dikarin îzah bikin û delîlan bidin ka ew çawa bi rêya matematîkê difikirin.

Zimanê swêdî û swêdî wek zimanê duyê

Îmtîhana giştî ji bo her du madeyên zimanê swêdî mişterek e û ji çend qisman pêk tîs. Tê de pirs hene ku şagird bi ferdî û di komê de bersiv didin. Bi rêya wan her du awayên pirsîyaran, îmkan ji bo şagirdan heye ku zanîna xwe di warên axaftin, sihbetkirin, xwendin û nivîsandinê de nîşan bidin.

Profîla zanîne û xwenirxandin çi ne?

Netîceyên şagirdî yên îmtîhanên giştî û nirxandîna mamostayî derbarê qabiliyetên din yên şagirdî di madeyên dersê de dikarin bi kurtî di profilên zanîne de bîs nîşan dan. Mîmkin e ev belge wek bingeş di sihbetên pêşdebirinê de bîs bi kar anîs.

Digel her îmtîhanê qismekê xwenirxandinê heye ku pê şagird li ser hûnbûna xwe difikire û qabiliyeta xwe di madeya eleqedar de wesif dike. Di demên paştir de, mîmkin e xwenirxandin digel profîla zanîna şagirdî bê hember kirin û di sihbeta pêşdebirinê de nîqaşa li ser wê bê kirin.

Agahdarîyên zêdetir li kûderê hene?

Agahdarîyên zêdetir li ser madeyên îmtîhanên giştî di malpera Daîreya dibistanan [Skolverketê] de hene

www.skolverket.se/bedomning

www.skolverket.se/garanti-tidigt-stod

Li wê derê link jî ji bo mînakên hin pirsîyaran îmtîhanan hene.

Peywendîyê bi Daîreya dibistanan bike

nationellaprov@skolverket.se